




BEYT Û
DESTANÊN
KURDÎ

Berhevkar: YAŞAR KAPLAN



BEYT Û DESTANÊN KURDÎ

Nûbihar

Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti. Büyük Reşitpaşa Cad.
Yümni İş Merkezi No: 22/29 Vezneciler-Fatih/İstanbul
Tel & Faks: 0212 519 00 09
www.nubihar.com | email: nubihar@gmail.com
Yayın Sertifika No: 16919

Weşan No: 285 | Edebiyat-Folklor

Beyt û Destanên Kurdî

Berhevkar: Yaşar Kaplan

ISBN: 978-605-9413-42-8

Çapa Yekem: 2019

Gerîndeyê Weşanê

Süleyman Çevik

Edîtor

Yunus Dilkoçer

Berg

İHB Reklam Ajansı

Mîzanpaj

Dawud Rêbiwar

Çapxane

Alioğlu Bas. Yay. ve Kağ. San. Tic. Ltd. Şti.

Orta Mah. Fatin Rüştü Sk. No: 1-3/A

Bayrampaşa/İstanbul

Tel: 0212 612 95 59

BEYT Û DESTANÊN KURDÎ

Berhevkar
Yaşar KAPLAN

Nûbihar

Yaşar Kaplan: Li gundê Seranî (Baştepe) yê ser bi Çelê (Çukurca) ya navçeya Culemêrgê hatiye dinê. Xwendina xwe ya seretayî li Culemêrgê qedand. Di sala 2004ê de ji Zanîngeha Selçûkê ji beşa Îlahiyatê derçû. Di sala 2011ê de li Zanîngeha Wanê Yüzüncü Yılê di Enstîtûya Zanistên Civakî Makezanista Felsefe û Zanistên Dînî de bi navê “Êzdiyatiya Îroyîn” teza xwe ya masterê qedand. Herwesa 2015 li heman zanîngehê di beşa “Ziman û Çanda Kurdî” de teza bi navê “Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn, Lêkolîneke Edebî û Dîrokî” ya masterê qedand. Pirtûkên wî yên bi navê “Günümüz Yezidiliği” û “Kaniya Stranan” di nav weşanên *Nûbiharê* de çap bûne. Di bin banê Zanîngeha Hakkariyê de xebatên xwe yên edebî, dîrokî û berhevkirina kelepora Kurdî didomîne. Nivîskar zewicî ye û babê sê zarokan e.

NAVEROK



Pêşgotin	07
Çend Têbinî	19
Destpêk	11
1. Destan	12
2. Jêder û Rêbaz	13
Metnê Destanan	17
1. Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn	19
1.1. Beşa Yekem	21
1.2. Beşa Duyem	27
1.3. Beşa Sêyem	33
1.4. Beşa Çarem	47
1.5. Beşa Pêncem	59
1.6. Beşa Şeşem	68
1.7. Beşa Heftem.....	82
2. Mem û Zîn	119
3. Sitî û Ferx	181
4. Hespê Reş (Borê Reş-Borê Qer).....	213
5. Yûsif Pêximber.....	249
6. Avdel Umeran.....	271
7. Şerê Kolana Qumriyê.....	291

8. Beyta Hetem.....	309
9. Beyta Birahîmxanê Hekarî.....	327
10. Beyta Îbrahîmê Kurê Pêximberî.....	337
11. Beyta Şêx Ebdusselam Barzanî.....	347
12. Beyta Garanê (Şerê Çelî û Tiyarîyan).....	353
Jêder	361
Ferhengok.....	362

PÊŞGOTIN



Di van dused salên dawiyê da edebiyata Kurdî di rewşeke awarte û metirsîdar ra derbas bûye. Ji ber rewşa Kurdan a siyasî û polîtîk edebiyata Kurdî wekî edebiyatên gelên din di rewşeke normal ra derbas nebûye. Çunkî edebiyatên gelên din bi piştgi-riya dewletên xwe yên netewî ve pêşveçûn û berfirehbûna xwe ya asayî bi rê ve birine. Lêbelê edebiyata Kurdî nebûye xwedanê vê îmkanê. Vê rewşê herçend karîgeriyên neyênî li ser ziman û edebiyata Kurdî kiribe jî edebiyata Kurdî bi temamî ranewestayê û pêşveçûn bi dest êxistine.

Wekî têtê zanîn edebiyata Kurdî li ser çar hêmanan hatiye avakirin: ziman, edebiyata klasîk, edebiyata devkî û edebiyata nûjen. Ji van hêmanan a ji hemîyan dewlemendtir edebiyata devkî ye. Edebiyata devkî malê gel e û di nava gel da belav e. Piştî serdemaya modern parastina edebiyata devkî ya di nava gel da belav bi metirsiya nemanê ve rûbirû maye. Taybetî gelên bdesthilatdar û bûne armancên bişaftinê zêdetir bi vê metirsiyê ra rûbirû mane. Kurd jî yek ji van netewan in. Heta niha di warê edebiyata devkî da ji aliyê lêkolîner û pisporên biyanî û xuyanî ve herçend xebat hatibin kirin jî ji ber rewşa Kurdan û Kurdî gelek kêmasiyên van xebatan çêbûne. Lewra divê bi çavekî zanistî edebiyata devkî bê tomarkirin û ev materyalên hatî tomarkirin bi çavekî zanistî bêne tûjandin, senifandin û nirxandin. Em çend salek e ji bo tomarkirina edebiyata devkî ya devera Hekariyan dixebitin. Di encama vê xebata me da, me şîya gelek cûreyên edebiyata devkî ya Kurdî tomar bikin. Em wisa hizir dikin ku heke lêkolînên tomarkirina hê-

mayên edebiyata devkî wekî dever dever bê tixûbkirin dê encamên baştir derkevîne meydanê. Lewra me jî xebata xwe bi devera Hekariyan ve tixûbdar kir. Di vê lêkolîna domdirêj da, me gelek beyt û destanên Kurdî tomar kirin. Di nava van beyt û destanên me tomarkirî da, 12 beyt û destan me ji bo çapê hilbijartin. Yek ji van destanan Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn e ya wekî yek ji girîngtirîn destana netewî ya Kurdî tê qebûlîkirin. Ev destane ji aliye me ve wekî teza lîsansa bilind hatibû amadekirin. Ji bilî destana Kela Dimdim destanên wekî Mem û Zîn, Sitî û Ferx, Hespê Reş, Yûsif Pêximber, Avdel Umeran, Şerê Kolana Qumriyê, Hetem, Biraahîmxanê Hekarî, Îbrahîmê Kurê Hz. Mihemed (s.), Şêx Ebdus-selamê Barzanî û Şerê Çeliyan û Tiyariyan jî me lê zede kirin.

Di amadekirina vê xebatê da gelek hevalan harîkarî dane me. Lewra em gelek minetdarên wan birêzan in: M. Xalid Sadîî, Ayhan Geverî, Nizar Eyûb Gulî, Hêriş Rêkanî, Yakup Demir, Lütfü Karadeniz, Mela Muhsîn Deravî, Arafat Er, Îhsan Akın, Cengîz Şen, Murad Adiyaman, Avdel Ömer Özkan, Reşit Akif Demir, İsmail Ölmez, Menduh Sergeli, İsmail Seyranoğlu, Zübeyr Çiftçi, Nazmi Pala, Abidin Mavigöz û hemî dengbêj û beytbêjên me sûd jê wergirtî ne. Di dawiyê da ez dixwazim gelek spasiya hevîna xwe bikim ku ew di xebatên min ên der barê tomarkirina edebiyata devkî da her wextekî ji bo min piştevan bû.

Yaşar KAPLAN
Culemêrg 2017

ÇEND TÊBINÎ

Ev destane li devera Hekariyan hatine komkirin. Lew taybetiyên devoka Hekariyan di nava xwe da dihevine. Ji bo sîdwergitineke baş, em fer dibînin behsa çend taybetiyên vê devokê bikeyn:

-Veqetandeka diyar ya pirjimariyê ne wekî “ên” lê wekî “êd” hatiye bikarînan. Wek mînak; “Çavên min” wekî “Çavêd min” tê gotin.

-Di devoka Hekariyan da cinavkên kesandinê wiha têne gotin: Ez diçim, Tu diçî, Ew diçît/diçîtin, Em diçîn, hûn diçîn, ew diçîn.

-Lêbelê kesandina çar lêkeran (Kirin), Birin, Dan, Xwarin ji yê dî cudatir in. Qertafên kesandinê yê van çar peyvên wiha ye:

Ez dikem, Tu dikey, Ew diket/diketîn, Em dikeyn, Hûn diken, Ew diken

Ez dibem, Tu dibey, Ew dibet/dibetin, Em dibeyn, Hûn diben, Ew diben

Ez dixwem, Tu dixwey, Ew dixwet/dixwetîn, Em dixweyn, Hûn dixwen, Ew dixwen

Ez didem, Tu didey, Ew didet/didetîn, Em dideyn, Hûn diden, Ew diden

Wekî li jorî diyar dibît; qertafên birra yekem: “im, î, ît-îtin, in, in-in” û birra duyem jî: “em, ey, et-etin, eyn, en-en” e.

-Herçendî di devoka Hekariyan ya rojane da nemabît jî di destanên me kom kirî da daçekên “li, ji, bi” wekî “le, je, be” dihatine bilêvkirin. Bo nimûne “li min” wekî “le min” dihatê gotin. Lêbelê me ev daçek ne wekî beytbêjan gotî, wekî axiftina rojane ya niha nivîsîn.

-Herwesa di orjînalê destanê da qertafa dema niha “di” jî wekî “de” dihatê bilêvkirin. Bo nimûne “ez diçim” wekî “ez deçim” dihatê gotin. Lêbelê ji ber ku ev forme di axaftina rojane ya Hekariyan da nedihate bikarînan me jî wekî “di” nivîsî.

-Di bendên destanan da bo hev girtin û lêkhatina kêşeya ristan, hinek deng/herf ji ristan hatine avêtin. Hindî ji me hatî, me tîpên/dengên keftî di nava kevanan da aşkera kirin. Heke tîp ne ji lêkeran keftîbin me tîpên keftî wergirtin nava kevanê, herwekî “ç[î] ya.” Lêbelê heke tîp ji qertafa demî ya lêkerê an jî ji daçekan keftîbin hîngê jî me bi bendikê ve diyar kirin. Wekî: “dibînîm: d’bînîm” an jî “ji min: j’min.”

-Gihaneka “û” ji bo lihevhatina kêşeyê hinek caran wekî “w” hatiye bilêv kirin. Wekî “Xudê û Resûl”: “Xudê w Resûl.”

DESTPÊK



Destan yek ji kevintirîn cûreyê edebiyata devkî ye. Di serdemên gelek kevin da derkeftiye meydanê. Mijarên destanan ji rûdanên dîrokî û civakî yên li ser civakan gelek karîger pêk tên. Destan, gelêrî ne, danêrên wê yên pêşiyê nahêne zanîn. Lewra destan wekî malê gelekî tene hesabandin. Edebiyata Kurdî ya gelêrî ji aliyê destanan ve dewlemend e. Heta niha gelek xebat ji aliyê lêkolînerên biyanî û xuyanî ve li ser edebiyata gelêrî ya Kurdî hatibin kirin jî ji ber rewşa Kurdan û Kurdî ya siyasî, ev xebat ne rêkûpêk in. Lewra ev lêkolîn di asta pêdivî da nînin. Der barê cûr û nimûneyên edebiyata gelêrî ya Kurdî da endîşeya wendabûn û jibîr kirinê her daîm li kar bû. Birastî dema mirov lê dinêre ev endîşe ji sedî sed ne rast e. Lêbelê kêmbûna lêkolînên zanistî li ser folklorê Kurdî wekî metirsiyekê hêj berdeham e.¹ Piştî piçek başbûna rewşa Kurdan û Kurdî ya siyasî, bizavên lêkolînê der heqê edebiyata Kurdî ya gelêrî da zêde bûn. Em jî dixwazin bi vê xebata xwe ve di vî babetî da valahiyeke zanistî tijî bikin.

Armanca vê lêkolînê ew e, her wekî me li jorê jî gotî, dewlemendkirina lêkolînên li ser edebiyata Kurdî ya gelêrî ye. Tomarkirin û tûjandina materyalên edebiyata devkî karekî gelek giran e. Heke ev xebat li zimanekî wekî Kurdî, rastî êrişên tunekirinê hatiye be, ev zehmetî hêj zêdetir dibin. Lewra pêdivî ye xebatên tomarkirin û tûjandina berhemên edebî yên gelerî li dû sistemekê û rêbazekê bêne kirin.

¹ Perteve, Ramazan, “Danasîn û Rewşa Giştî ya Xebatên li ser Folklor û Edebiyata Kurdî ya Gelêrî”, *Edebiyata Kurdî ya Gelerî, Dîrok-Teori-Rêbaz-Literatur-Berawirdî- 1*, Weş. Avesta, Stenbol 2015, r. 14, 15.

Ev xebata me ji sêzde beşan pêk tê. Di beşa yekem da wekî cûreyekî edebî li ser destanê hatiye rawestan. Piştî danasîna destanê, behsa destanên di edebiyata dinyayê û di edebiyata Kurdî da û cûrên destanê û merhalêyên avabûna destanan hatiye kirin. Di duwanzde beşên din da metnên beyt û destanan hatine rêzkirin. Li pêşiya metnê her beyt û destanekê kurtedanasînek hatiye danan. Di vê danasînê da berê cûreyê beyt û destanê yê edebî hatiye diyarkirin. Paşî bi kurtî behsa naveroka beyt û destanê hatiye kirin. Di dawiyê da jî behsa jêderên beyt û destanê hatine wergirtin hatiye kirin û hinek danasîn der barê ruxsarê metnê da hatiye danê. Li dawiya pirtûkê ferhengokek lê hatiye zêdekirin.

1. DESTAN

Destan, cûreyekî edebî yê kevin e. Peyva “dastan” an “destan” peyveke Îranî ye. Di Kurdî da hem peyva destan hem jî peyva “beyt, qîset” tê bikaranîn. Li hemberî vê peyvê li Rojava “epos” tê bikaranîn. Epos bi eslê xwe Grekî ye û tê maneya çîrokên menzûm. Epos, ew serboriyên wesifdar û derasayî yên xweda, xwedawend, wekxweda û lehengan e ku bûyerên mezin ên qewimîne û di bîra civakê da bi cih bûne². Di destanan da bûyerên dîrokî û civakî yên karîgeriyeke mezin li ser civakê hiştî bi awayekî menzûm têne vegotin. Di jiyana netewan da gelek serhatiyên rengvedana wan bi borîna demê ra nehên jibîrkirin hene. Ev serhatî dibe ku şerek an qehremaniya şexsekî an jî afeteke li kûrahiya civakê şopa xwe hiştî be. Ev serhatî bi rêka destanê ve têne renginkirin û dewlemendkirin. Ji bo bi sanahîtir di bîra civakê da bê parastin bi awayê menzûm û rewanbêjî têne vegotin.

Wekî tê zanîn destan di sê qonaxan da derbas dibin. 1. Derketina destanê: Di vê qonaxê da hinek bûyerên dîrokî û civakî diqewimin û ev bûyer di xeyal û şîûra netewê ya hevpar da teşe digire. Kesên di van bûyeran da cih girtî di xeyala civakê da cihekî girîng digirin. 2. Belavbûn: bi dewlemendkirina bûyer û lehengan ve destan belav dibe û nîfş bo nîfşî tê veguhastin. 3. Tomarkirin:

2 Perteve, Ramazan, *b.n.b.*, r. 221, 222.

Di vê qonaxê da destan ji aliyê hunermendekî an jî pisporekî ve tê nivîsîn û tomarkirin.³

Destan di nava xwe da wekî destanên xweristî û destanên çêkirî dabeş dibin. Destanên xweristî ji bûyerên kevin yên karîgeriyeke mezin li ser bîra civakê hiştî pêk tên. Ev cûre gelêrî ne û danerê wan ne diyar e. Lewra wekî malê gel an netewekê têne hisabkirin. *Gilgamişa* Sumeriyî, *Kalavelaya* Fîniyan an jî *Memê Alanê* Kurdan nimûneyên vî cûreyê ne. Destanên çêkirî jî ji bo destanên ji aliyê helbestvanekî ve hatine çêkirin têne gotin. *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî û *Bihuştaya Wenda* ya Milton em dikarin bo vî cûreyê wekî mînak bidin.

Destan bi sê awayan hatine honandin. Hinek menzûm (helbestkî), hinek pexşan hinek jî ji menzûm û pexşana tevlihev hatine honandin. Di edebiyata Kurdî da destan li dû naveroka xwe dibin gelek beş: Destanên mîrxasî wekî *Destana Kela Dimdim*, *Şerê Kolana Qumriyê*, *Kerr û Kulik*; destanên evînî wekî *Memê Alan*, *Ferx û Sitî*, *Sînemxan*; û destanên ayînî wekî *Hespê Reş*, *Kekemîr*, *Avdel Umeran*, *Şêxmend*, *Zembîlfiroş*.

2. JÊDER Û RÊBAZ

Me xebata xwe ji aliyê mekanî ve tixûbdar kiriye. Xebata me li ser beyt û destanên li devera Hekariyan e. Lewra dengbêj û beytbêjên ev destane digotin ji vê deverê hatine destnîşankirin. Ev beyt û destane ji dengbêj û beytbêjên li devera Hekariyan hatine tomarkirin. Me, pêşiyê dengê wan qeyd dikir û paşî jî ev qeyde deşifre dikirin. Ji ber ku ev dengbêj û beytbêje hemî yên devereke bûn di navbera varyantên beyt û destanan da cudahiyan pir hindik hebûn. Em dikarin bibêjin van varyantên cûda hemiyar hevdu temam dikirin. Hinek hûrgiliyên li nik varyantekê heyî, dibû ku li nik a din nebe. Cudahiya van varyantan zêdebarî di kurtbûn û dirêjbûna destanê da derdikefte meydanê. Sebebê vê çendê neman beytbêj û dengbêjên pisporekî bû. Jêderên me, ji mêja were ev beyt û destan negotibûn. Lewra heke me piştrastî bi yekî tenê ki-

3 Yetiş, Kazım, “Destan”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, İstanbul 1994, r. 9/202.

riba, serûberê beytê hemî dernedikefte meydanê. Çunkî hinek bûyer û hûrgiliyên varyantekê digot di varyanta din da nebû. Lêbelê dema me ev varyantên cûda hemî li ser hev kom dikirin, vê çendê honak û rista rûdanan a destanan birêkûpêktir dikir. Bi saya wekî yek destan komkirina van varyantan gîvilê (sîlûetê) beyt û destanan xweştir xuya dibû. Yanî heke em bi awayekî din bibêjin, ev varyant hinek kême hinek jî têr û tijîtir bûn. Dema me varyant hemî berawird kirin, me dît ku her valahiyeke di varyantekê da bi saya varyantên din tijî dibin. Û bi vî awayî serûberê beyt û destanê birêkûpêktir derdikefte meydanê. Lewra me her varyantek serbixwe durist nekir, berevajî vê, me ev varyant hemî wekî varyantekê durist kirin. Ji bo vê çendê du palderên girîng hebûn: destan di heman herêmê hatiye komkirin û hema hema dengbêj û beytbêjan heman bendên wekî hev digotin.

Beyt û destanên di vê pirtûkê da hatine komkirin li devera He-kariyan ji devê dengbêj û beytbêjen cuda cuda hatine tomarkirin. Ev destan bi rêka denggirê ve hatiye qeydkirin û paşê jî hatiye deşîfrekirin. Hinek jêderan beyt an jî destan bi temamî digotin. Hinekan jî hinek çiq û ta jê digotin. Kesên me beyt û destan jê wergirtû di herêmê da wekî beytbêj û dengbêj tene nasîn. Em dikarin bi vî rengî ewên beyt û destan ji bo me gotî bidin nasîn.

-Fatmaya Yasîn (Fatma Taş): Xelkê gundê Gêmanê (Köprülü) ye ya ser bi navçeya Çelê (Çukurca) ya girêdayî Culemêrgê. Di 1923ê da hatiye dinyayê. Di sala 2016yê da wefat kir. Ji bilî Kurdî, Tirkî jî dizanî. Babê wê Pirmîs beytbêjekî bi nav û deng bû û piraniya beytên xwe ji babê xwe girtine.

-Ebdulqadirê Gwîzereşî (Abdülkadir Kızılkaya): Xelkê gundê Gwîzereşê (Cevizli) ye ya ser bi navçeya Çelê (Çukurca) ya girêdayî Culemêrgê (Hakkâri). Ji 70 saliyê boriye. Ji bilî Kurdî, Tirkî jî dizane. Xwedan bîr û hafizeyeke gelek bi hêz e. Niha li taxa Medresê li Culemêrgê niştecih e.

-Sadiqê Şetinisî (Sadık Yılmaz): Xelkê gundê Şetinîsa Jorî (Yukarı Kayacık) a girêdayî Culemêrgê ye. Di vegotina destan û serhatiyên da destekî bilind hebû. Di sala 1994ê da di 54 saliya xwe da çûye ber dilovaniya Xudê.

-Ebdulkerîm Zawîteyî (Abdülkerim Akar): Xelkê gundê Zawîte (Kayalık) ye ya ser bi navçeya Çelê (Çukurca) ya girêdayî Culemêrgê. 55 salî ye. Niha di Mudiriyeta Çandê ya Culemêrgê da wekî memûr dixebite. Lîse (amadeyî) qedandiye.

-Ehmedê Bayî (Ahmet Coşkun): Xelkê Gundê Bayê (Bay) ya ser bi Culemêrgê ve ye. Di sala 1997ê da di 65 saliya xwe da çûye ber dilovaniya Xudê. Me ji kaseteka wî îstifade kir.

-Ehmedê Asmînê (Ahmet Şen): Xelkê gundê Hirkaşê (Kıncıklı) ya ser bi navçeya Çelê ya girêdayî Culemêrgê ye. Ji 100 saliyê boriye. Vê gavê li Çelê niştecih e.

-H. Ebdilayê Keleş (Abdullah Demir): Xelkê gundê Marifanê (Kurudere) ye ya ser bi navçeya Çelê ya girêdayî Culemêrgê. 75 salî ye. Lîse qedandiye. Ji Mudiriyeta Perwerdeya Millî ya Culemêrgê malnişîn bûye. Niha li Culemêrgê niştecih e.

-Şe'banê Peyanisî (Şaban Dinçer): Xelkê gundê Peyanisê (Geçitli) ya ser bi Culemêrgê ye. Babê wî Teyfûrê Qerdaş dengbêjekî berkeftî bû. Şe'ban vê gavê li Wanê niştecih e. Derdora 60 salî ye.

-Leşker Şivîşkî (Leşker Demir): Xelkê gundê Şivîşkê (Kavaklı) ye ya ser bi navçeya Çelê ya girêdayî Culemêrgê. Derdora 60 salî ye. Di Mudiriyeta Îtfaiyê ya Şaredariya Culemêrgê da dixebite. Niha li Culemêrgê niştecih e.

-Selîm Peyanisî (Selim?): Xelkê gundê Peyanisê (Geçitli) ye ya ser bi Culemêrgê. 68 salî ye. Li gundê xwe niştecih e û bi cotyariyê ve meşxûl e.

-Seyyîd Omer Kelêtanî (Ömer Demir): Xelkê gundê Kelêtanê (Taşbaşı) ye ya ser bi Culemêrgê. 79 salî ye. Li gundê xwe niştecih e û bi cotyariyê ve meşxûl e.

-H. İskenderê Biyadirî (İskender Akar): Xelkê gundê Biyadir (Narlı) ye ya ser bi navçeya Çelê ya girêdayî Culemêrgê. Nêzikî 100 salê bûye. Li gundê xwe niştecih e.

-Dirbaz Axacanî (Dirbas Mavigöz): Xelkê Culemêrgê ye. Li taxê Medresê niştecih e. 87 salî ye. Dibistana seretayî qedandiye.

-Salihê Marifî: Ji gundê Marifanê ye. Derdora 67 salî ye. Li Culemêrgê li taxa Kanîsarkê niştecih e.

-H. Sebriyê Tiyarî: Xelkê gundê Tiyarê ye (Kazan) ya ser bi Çelê ve. Di sala 2015 da çûye ber dilovaniya Xudê.

-H. Mistefa Gareyî (Mustafa Yılmaz): Xelkê gundê Gare ye (Dereüstü) li devera Silehiyan ya ser bi Culemêrgê ve. 70 salî ye. Li gundê xwe niştecih e û bi cotyariyê ve meşxûl e.

-H. Ebdilayê Qasê (Abdullah Ceyhan): Xelkê gundê Gwîzereş (Cevizli) ya ser bi Çelê ve ye. Derdora 70 salî ye. Li Culemêrgê taxa Kanîkewkan niştecih e û bi esnafiyê ve meşxûl e.

-Haco Zawîteyî (Hacı Akar): Xelkê gundê Zawîte (Kaya-lık) a ser bi Çelê ve ye. Ji mêj ve wefat kiriye. Babê Ebdulkerîm Zawîteyî ye. Me ji kaseteka wî îstifade kir.

-H. Simahîl Siyawirkî (İsmail Kaçar): Xelkê gundê Siyawirkê ye ya ser bi Culemêrgê ve. 69 salî ye. Li gundê xwe dimîne û bi cotyariyê ve meşxûl e.

-M. Salih Qewalî (Salih Kaval): Xelkê gundê Qewalê (Kaval) a ser bi Culemêrgê ve ye. Li devera Lêwînê bi dehan salan melatî kiriye û vê gavê li gundê xwe niştecih e.

-Eyşa Şivîşkî: Xelkê gundê Şivîşk e ya ser bi Çelê ve. Derdora şêst salî ye. Vê gavê li Culemêrgê di taxa Êrisan niştecih e. Kabanîya malê ye.

-Ebdilayê Birahîm (Abdullah?): Xelkê gundê Gêmanê (Köprülü) ya ser bi Çelê ve ye. Derdora 75 salî ye. Li gundê xwe niştecih e.

-Mela Tahir Tuxîbî (Tahir Demir): Ji gundê Tuxîbê ye. 55 salî ye. Lîse (Amadeyî) qedandiye. Niha li Mizgefta Melîk Esed ya li Culemêrgê melayê resmî ye.

METNÊ DESTANAN



1. KELA DIMDIM Û XANÊ LEZÊRÎN



Destana Kela Dimdim û Xanê Lezêrîn yek ji girîntirîn destana netewî ya Kurdî ye. Jêdera mijara vê destanê rûdaneke dîrokî ye ku serûberê rewşa Kurdan a siyasî ya wê serdemê di nava xwe da kom kiriye. Vê destanê karîgeriyeke gelek mezin li ser civaka Kurd hiştiye. Ji ber vê egerê hêj piştî rûdanê wekî destan hatiye honandin û di nava Kurdan da belav bûye. Ev destan ji aliyê civaka Kurdî ve gelek hatiye hezkirin. Di edebiyata Kurdî ya klasîk da jî wekî berhemmeke menzûm hatiye nivîsîn⁴. Herwesa ji aliyê lêkolîner û pisporên biyanî û xuyanî ve gelek xebat li ser hatine kirin.

Vê destanê mijara xwe ji rûdaneke dîrokî wergirtiye. Ev bûyer di salên 1608 û 1609ê da qewimiye. Devera ev bûyer lê qewimî Kela Dimdim e ku dikeve başûrê rojavayê bajarê Urmîyê. Mijara vê destanê şerê navbera Kurdên Biradostî û Dewleta Sefewîyan e. Sefewîyan di bin rêveberiya Şah Ebbas da xwestiye desthilatdariya Mîrgeha Biradostîyan ji nav biben. Hemberî vê çendê Kurdên Biradostî di rêberiya Emîrxan Biradostî an jî Xanê Lezêrîn da li hemberî Sefewîyan berxwedaneke mezin kirine. Lêbelê di encama şer û dorpêçeke giran û domdirêj da Kela Dimdim keftiye destê Sefewîyan. Kurdên Biradostî bi mîrxasî û qehremanî şer kirine heta ku hemî yek bi yek hatine kuştin. Lehengê destanê yê serêkî Mîrê Biradostîyan Xanê Lezêzîn e. Ji bilî wî destebirayê wî Xanê Mukrî, kurê Xanê Lezêrîn Ebdal Beg, Şah Ebbas û wezîrê wî Xelîfe, Mehmûdkê Alekanî, Le'lixana dayika Xanê Lezêrîn û Xan Periya bûka wî lehengên din ên destanê ne.

4 Sadîni, M. Xalid, *Feqiyê Teyran, Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, Weş. Nûbihar, Stenbol 2010.

Li ser vê bûyera dîrokî ya gelek karîger û dilsoj civaka Kurd gelek li ber xwe keftiye. Vê bûyerê tesîreke mezin li ser Kurdan kiriye. Lewra ev bûyer wekî destanekê li ser devê dengbêj û beytbêjan serejinû hatiye vegotin. Ev vegotina devkî ji aliyê Kurdan ve gelek hatiye bergermkirin û qebûlkin. Lewra li hemî aliyên Kurdistanê ev destane hatiye vegotin. Di vê vegotina destankî da ev bûyera dîrokî bi hizr û bîr û xeyalên beytbêj û dengbêjan ve hatiye xemilandin, rengînkirin û dewlemendkirin. Bi awayekî rêkûpêk rista bûyeran li dû hev hatiye girêdan û bi şeweyekî rewanbêjî û herikbar hatiye duristkirin. Lewra guhdariya vê destanê tameke xweş daye guhdaran. Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn ji aliyê temayan ve gelek dewlemend e. Ji ber ku destan behsê mîrxasî û qehremaniyê dike temayên netewî serdest in. Di destanê da mirov rastî xîret û hemaseteke mezin tê. Herwesa temayên Kurdîni û welatparêzî, dilsozî û xiyanet, jin, dîn û bawerî û ray û tedbîrê gelek bi hostayî hatine honandin. Destan xîtabî hestên netewî dike û kel û çoşekê dide guhdaran.

Ev metnê destanê li devera Hekariyan ji devê dengbêj û beytbêjên wekî; Ebdulqadirê Gwîzereşî, Sadiqê Şetinisî, Ebdulkerîm Zawîteyî, Ehmedê Bayî, Ehmedê Asmîne, Salihê Marûfî, H. Ebdilayê Keleş, Leşker Şîvişkî, Selîm Peyanisî, Seyyîd Omer Kelêtanî û H. Îskenderê Biyadiîrî hatiye tomarkirin. Ji ber ku ev varyant hemî yên devereke ne û ferq û cudahiyan wan gelek kêmbûn; ev varyante wekî yek destan hatiye nirxandin. Ev destan nêzîkî ji heftsed bendên ku piraniya wan sêrêzî ne pêk tê. Her rîstek ji heşt kîteyan pêk tê.

1.1. BEŞA YEKEM



Navê Xanê Lepzêrîn yê rastîn Umer e. Ew xelkê Hizarcotê⁵ ye. Babê wî hêj ew biçûk miribû, lewra sermiyanê wî dayika wî Le'lixan bû. Rojekê xewnekê dibînît ku roj û heyy pêkve têne mala wî. Ew gelek dimîne di bin tesîra xewna xwe da. Diçît nik melayekî û te'bîra xewna xwe jê dipirsît. Mela dibêjîte wî: *"Tu dê gencxaneyeke gelek mezin bibînî. Tu dê bişêy bi saya wê gencxanê heft salan şerê dewletê bikey. Mişext, mêrkuj û mîrxas dê li dora te kom bibin. Navûdengê te dê gelek belav bibît. Tu dê bimirî, lêbelê navûdengê te dê li dinyayê bimînît."* Paşê Xanê Lepzêrîn li welatê xwe Hizarcotê xwîndar dibît. Lewra terka welatê xwe diket û tete nik Şahê Ecem:

Xulimîne xulimîne
Gelî xelk û alemîne
Guh biden dil û yeqîne
Qiseta Xanê Lepzêrîn e

Qiseta Xanê zerîndest e
Kamera xîretê beste
Xelkê xweşmêr dane deste

Xelkê xweşmêr dane vê ra
Wê d'bestin kemerêd zêra
Navûdeng dinyayê gêra

5 Hizarcot: Gundek e li devera Akrê li nav Zêbariyan.

“Hey Dimdimo kavl û wêran
Meskenê piling û şêran
Rovî lê d’ken geşt û gêran
Rehmet day û babêd guhdêran.”

2. MEM Û ZÎN



Destana Mem û Zîn an jî Memê Alan yek ji girîntirîn destana Kurdî ye. Lehengên vê destanê Zîna xwişka Mîr Zêndînê mîrê Cizîra Botan û Memê kurê mîrê Mexrebzemînê ye. Em baş nizanin kanê mebest ji Mexrebzemînê kî derê ye. Ji destanê wisa tê têgehiştin ku welatê Memo dikeve rojhilatê Cizîrê. Çunkî Çemê Dicle derbas dibe paşî digehe Cizîrê. Ev çende jî eşkera dike Mem xelkê devereka rojhilata Cizîrê ye. Li devera Şaxê ya qeza Wanê eşîreteke bi navê Alan heye û ev eşîret babîkê eşîreta Ertoşiyana e. Lêbelê em baş nizanin kanê Memê çi têkêlî digel vê eşîretê heye an ne. Piraniya destanê li Cizîra Botan derbas dibe. Ebdal Begê babê Zînê di sedsala XVan da li Botan hukim kiriye. Em wisa têdîgehin ku ev rûdane di vê sedsalê da qewimiye.

Der heqê ciwantirîn kesê wî zemanî da melaîket munaqesê dîkin. Hinek dibêjin Mem ciwan e hinek jî dibêjin Zîn. Melaîket di şevêkê da Zîne radîkin û dibin oda Memî. Nasyariya Mem û Zînê bi vî rengî dest pê dike. Paşî melaîket Zînê radîkin û dibine Cizîrê. Mem sibê radibe û ya şeva din di oda xwe da nabîne. Memê jar dikeve li pey jivana xwe û serhatiya wan ya dilsoj li Cizîra Botan dewam dike.

Destana Mem û Zînê ya gelêrî bi du rengan hatiye vegotin. Versiyona pêşiyê ya deverên Serhed û Beriya Jêrî ye ku Roger Lescot⁶ ew tomar kiriye. Versiyona duyê ya deverên Botan, Hekarî û Bahdînan e. Versiyona ewilî bi rengê serwaya nijandî tê gotin û di navbera bendan da hikayekirin nîne. Versiyona duyê da hem bend têne

6 Roger Lescot, *Memê Alan*, Weş: Avesta, Stembol 1997.

Wextê Qere Tajdîn we gotî, dest da xencerê û ji cih bezî Beko. Beko bezî da destê xwe kêla Memo werînît xwe avête bextê wî. Negehişte vê mirazê. Girt û da ber xenceran. Bekoyê xwe kuşt, dirand avête wê derê. Got: "Wellahî ez nehêlim Beko gor û kifin bête veşartin. Herkes piştiyek daran bo min bînît, ez dê Beko bisojim." Gizreyeka daran berhev kirin, Beko kirin tê da sotin, kirin xwelî. Dibêjin hingê çipkeke xwîna Beko firiye keftiye mabeyna ziyaretî, mabeyna kêla Memo û Xatûn Zînê. Bûbû duriyek û şîn bûbû. Vêca Rebbil-alemîn wesa çêkiriye li cennetê Beko dergevanê herdukan e. Rehmet li day û babêd guhdaran.

3. SITÎ Û FERX



Beyta Sitî û Ferxan serhatiyeke kevin a evîne ye ku Kurdan di civat û şevbihêrkên xwe da guhdarî lê kiriye. Ev serhatiye li ser evîna du aşiqên bê mirad hatiye honandin. Hem bi bend hem jî bi axaftin tê vegotin. Ji aliyê motîfan ve gelek dewlemend e. Di vê beytê da serhatiya du evîndaran tenê nîne. Şeytan, xirabîxwaz, dar û ber, heywanat û nebatat, berf û ba jî têkelî di vê serhatiyê da heye. Serhatiyeke bi rêkûpêk û herikbar e. Guhdariya wê tamedê dihêle li ser dilê guhdaran.

Sitî û Ferx dotmam û pismam in. Xelkê bajêrê Xumaroyê ne. Em baş nizanin kanê Xumaro li kî derê ye. Xumaroyek li Şemdî-nana qeza Culemêrgê heye. Lêbelê beytbêjan digot ev Xumaro ew nîne. Beytbêjan wesa bawer dikir Xumaro bajêrek e li devera Bahdînan. Ferx û Sitî bi rengê efsanewî tene dinyayê. Ji bilî însanan hemî mexlûqat ji hatina wan xeberdar e. Şeytan di nava xwe da kom dibin û dibêjin: "Heke ev herdu aşiq û dildarên dilpak bigehine êkûdu, êdî çî rola me di dinyayê namînît." Lewra şeytan naxwazin du evîndarên wekî Sitî û Ferxan pak û dilsax bigehine hevdu. Di beyte da Ferx wekî mirovekî ewliya tê danasîn. Duayên wî yek û yek qebûl dibin. Ji ber vê çendê, hemî mexlûqat xwe ji nîfina wî diparêze û xizmeta wî dikin. Şeytan li ser rengê mirovan xwe nîşanî wan dide û fesadiyeke wesa dike ku bikare Ferx û mamê wî bike dijminê hev. Ji vê derê wê ve, cihê destanê xwe vediguhêze û Ferx qesta Xanê dike. Xanê gundê Ehmedê Xanî ye. Li wê derê Ehmed Axayê xalê Ferxî heye. Êdî serhatiya wan li vê derê dewam dike.

4. HESPÊ REŞ (BORÊ REŞ-BORÊ QER)



Beyta Hespê Reş beyteke dînî ye. Di edebiyata Kurdî ya Gelêrî da derheqê medhên Hz. Pêximberî û hevalên wî da gelek beyt û serhatî hene. Ev beyt û destan piranî ji aliyê derwêşan ve dihatine xwendin. Em dikarin ev cûre beytan wekî menaqibname, xezawatname, cengname û bettalnameyan bidin nasîn. Li ser rûdanên xeyalî hatine avakirin. Beyta Hespê Reş jî li ser rûdaneke xeyalî hatiye avakirin. Di vê beytê da serhatiya Hz. Umer û Hespê Reş hatiye vegotin.

Wekî ji beytê diyar dibe, Hespê Reş heywanekî qudretî bûye. Hespê qiralekî kafiran bûye, bawerî bi Hz. Pêximberî înyê û Pêximber jî bi vê çendê hesiyaye. Hz. Pêximberî gotiye hevalên xwe, kî ji we dê bikare biçê Hespê Reş bo min bîne. Hz. Umer ev kare wergirtiye stûye xwe. Bi vî rengî serhatiya Hz. Umer û ya Hespê Reş dest pê dike. Der heqê cih û warê Hespê Reş da, beyt-bêjên me du der destnîşan kirin. Cihê ewilî Kela Şûşê ye ya nêzikî bajarê Akrê ya Başûrê Kurdistanê. Vê gavê jî wê derê cihê heye dibêjinê "Afirê Hespê Reş." Cihê duyê Kela Bêgîrê ye ya dikevîte devera Lêwînê ya nêzikî Culemêrgê. Gelê Culemêrgê wesa bawer dike ku xelkê gundê Bêgîrê ji nîfşê wî qeşe (keşe) ye yê ku harîkariya Hz. Umer kirî. Belê ji bilî van herdu cihan hinek deverên din jî hene ku xelk bawer dike Hespê Reş ji wê deverê ye. Her çawan be, wesa diyar dike Beyta Hespê Reş û yên wekî wê, li ser rûdan û serhatiyên di dema standina Kurdistanê ya ji aliyê Muslimanên Erebb ve hatine honandin.

Kafir wê şeqandin
Wan cihan derandin
Meşkêd meyê peqandin

Ker 'ewirê şîn e
Tavek baranê bîne
Sonda Elî cih bîne

Cebraîl tê j' beheştê
Hem seyran û hem geştê
Nivêja nivro gehiştê

Bor û hemî sehaban
Dil gehiştê miradan
Rehmet li day û baban.

5. YÛSIF PÊXIMBER



Serhatiya Hz. Yûsif (e.) hem di Tewratê da hem jî di Qur'a-na Pîroz da derbas dibe. Di edebiyata gelek miletan da serhatiya Hz. Yûsif, wekî serhatiyeke evînî ya di navbera Yûsif û Zuleyxayê belav bûye. Di edebiyata Kurdî da jî, hem edebiyata klasîk hem jî di edebiyata gelêrî da, serhatiya Yûsif û Zuleyxayê cih girtiye. Selîmiyê Hîzanî bi terzê mesnewiyê ev serhatiye nivîsiye⁷. Di edebiyata tesewifî ya Kurdî da jî serhatiyên gelek pêximberan yên wekî Hz. Îbrahîm, Hz. Îsmâil, Hz. Silêman û Belqîsayê û Hz. Eyûb bi menzûm hatine honandin û ji aliyê derwêşan ve bi awayê bi lédana defê ve hatiye gotin. Beyta Yûsif û Zuleyxayê jî yek ji van beytan e ku ji aliyê derwêşan ve dihate gotin.

Me ev beyte ji devê Xaleta Fatimaya Yasîn wergirtiye. Ew xelkê gundê Gêmanê bû. Gêman gundek e ser bi qaza Culemêrgê Çelê ve. Dema me ev pîrejine dîtî, temenê wê ji nehêd saliyê borîbû. Vê pîrejînê ji bilî Kurdî, Tirkî jî baş dizanî. Wê ev beyte ji babê xwe wergirtibû. Babê wê beytbêjekî meşhûr ê wê deverê bû. Xaleta Fatimayê ji bilî vê destanê hinek bendên Sîtî û Ferx, Beyta Aşî û Beyta Îbrahîmê kurê Pêximberî jî ji bo me gotin. Di vî gundî da pîremêrekî dî bi navê Mamê Ebdilayê Birahîm hebû. Ewî jî bo me Beyta Nesîhetan ya Mela Huseynê Bateyî ji ber got. Dema bendên Beyta Yûsif û Zuleyxayê nedihatîna bîra xaleta Fatimayê, wî tîna bîra wê. Bi heçî halê heyî me destan ji van herdu beytbêjan tomar kir. Belê mixabinî salek piştî hîngê Xaleta Fatimayê wefat kir. Xudê rehma xwe lê bike.

7 Selîmiyê Hîzanî, *Yûsif û Zuleyxa*, (Edîsyon- Kîrîk û Amadekar: Ayhan Gevêrî), Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013.

Ewî bêhn kire kirasî
Li ser û çavê xwe husî
Çav lê geş bû û teyisî
Çi derd nîne di bê çare

Yûsif li Misrê xundkar e
Ji bo te kaxez hinare
Hûn malê biken di bare
Werin Misrê çi xweş war e

Ewan kar kirin, kar kirin
‘Êl û ‘elat di bar kirin
Terka warê di par kirin
Mewten hêla bi yekcare

Bab û kur vêkra gehiştin
Xwe têk werdan û veniştin
Rondikêd keyfê diriştin
Êdî rakirin nîhare

Çi serhatiyek di çê ye
Yê di xudanê sebrê ye
Dê bibît mîrê Misrêye
Rehmet her kesê guhdare

6. AVDEL UMERAN



Beyta Avdel Umeran di edebiyata Kurdî da nimûneyek e ji bo cûreyê futûhatnameyan. Wekî tê zanîn futûhatname behsa serhatiyên ji aliyê Muslimanan ve standin û fetihkirina deverên xeyrî musliman dike. Beyta Avdel Umeran ji li ser standin û fetihkirina Kurdistanê ya ji aliyê Muslimanan ve hatiye honandin. Kurdistan di serdema Hz. Umer da (634-644) ji aliyê Muslimanan ve hatiye standin. Avdel kurtkirina navê Ebdullahî ye. Kurdan dema navê Ebdullahî bihîstin, nekarîn bi vî rengî telafûz bikin. Lewra sivik kirin û wekî Avdel telafûz kirin. Ev nave vê gavê jî di nava Kurdan da belav e. Wesa diyar e Kurdan, ji ber zêdebûna navê Ebdullahî di nav Ereban da, Erebi bi navê Ebdullahî (Avdelî) simbolîze kirine. Di Kurdistanê da cihên pîroz yên bi navê Avdel Umerî zehf in û serhatiya wan cihan bi sehabiyên an jî nîfşê duyê û sêyê yên Ereben Musliman ve hatiye girêdan. Li Kurdistanê gelek mizgeft an jî nîşanên din ên wekî ziyaret an jî cihên şerî, wekî teberukên Avdel Umerî hene. Ev diyarde hemî îşaretî bi vî çendê dikin ku Kurdan fatihên Musliman yên pêşiyê di bin navê Avdelên (Ebdullahên) Umerî yanî leşkerên Îmam Umerî da bi nav kirine.

Destana Avdel Umeran, rûdanên der barê standina Kurdistanê bi rengekî xeyalî xemilandiye û vegotiye. Di destanê da Avdel, xelkê Medîne ye. Kurekî êtîm û sêwî ye. Ji aliyê jinbabê ve hatiye xwedankirin. Ew di heft saliya xwe da şevêkê xewnekê dibîne ku Xudê emir dide wî da ew Îslamê belav bike. Ew, xewna xwe ji bo jinbaba xwe dibêje. Jinbaba wî dixwaze wî, ji vî biryarê bizivîrîne. Jinbaba wî dibêje: *“Heke te mîratî divêt, em dê te bikeyn mîr. Belê vê xewnê ji bîr bike.”* Lêbelê ew qanîh nabe. Vê carê jinbaba wî dibêje wî: *“Tu ne ji ber xezayê dixwazî derkevî, tu dixwazî*

7. ŞERÊ KOLANA QUMRIYÊ



Beyta Şerê Kolana Qumriyê, beyta mêrxasî û qehremaniyê ye. Ev beyta li ser rûdaneke dîrokî hatiye honandin. Qumriye navê gundekî ye li devera Berwarî Bala, bakurê Amêdiyê û nêzîkî qeza Çelê. Ev rûdane di navbera salên 1798 u 1801yê qewimiye. Li gundê Qumriyê keleyek heye bi navê Kela Qumriyê. Keleyek kevnare ye. mîrên Eşîreta Berwariyan lê diman. Ev eşîrete ser bi mîrgeha Bahdînan ve bû û girêdayî mîrên Amêdiyê bû. Dema Îsmâil Paşayê (1768-1798) Mîrê Bahdînan wefat kirî, wesa wesiyet kiribû ku li piştî wî kurê wî yê ji hemiyar biçûktir Mihemed Teyar Paşa li şûna wî bibe mîr. Lêbelê giregirên Bahdînan ev wesiyete bi cih neînan û li şûna wî, kurê Îsmâil Paşa yê mezin Murad Paşa (1799-1803) kirine mîr. Mihemed Teyar Paşa jî li Akrê niştecih bû. Îsmâil Paşa hemî malê xwe yê giranbiha ji bo Mihemed Teyar Paşa hêlabû. Ew jî ev male hemî neqlî Kela Qumriyê kiribû. Heta ku kurê Mihemed Teyar Paşa Mihemed Se'îd Paşa di sala 1825ê bûye mîrê Bahdînan, di navbera kur û bira û birazayên Îsmâil Paşa da şer û lêkdanan dewam kir. Van mîran li hemberî hevdu bertîl didane waliyên Mûsil û Bexdayê. Waliyan jî kê zêdetir bertîl dabanê harîkariya wî dikirin. Di van çend salan da eşîretên Bahdînan parçe parçe bûbûn û welat jî bi yekcarî xerab bûbû.⁸ Di beytê da behsa şerê di navbera Îsmâil (Simahîl) Axayê Zêbarî, Feqe Ebdurehîmê Mîrê Berwariyan û Melîkên Tiyariyan yê Mesîhî hatiye kirin. Di sala 1777ê de Îsmâil Paşayê (1768-1798) Mîrê Bahdînan

8 Ji bo wergirtina agahiyên zêdetir derheqê vê serdemê bnr.: Îmad Ebdusselam Raûf, *Tarixu Umerau Bahdînan*, www.alukah.net

8. BEYTA HETEM



Beyta Hetem, di edebiyata Kurdî da nimûneyeke baş e ji bo cûreyê cengnameyan. Cengname ji bo metnên menzûm an jî yên pexşan ên behsa mêrxasî û qehremaniya lehengên dînî û netewî yên di şer û lêkdanên digel dijminan da tê gotin. Di edebiyata Kurdî da em dikarin beytên behsa şerên Hz. Elî, Hz. Umer, Hesên û Huseyn, Mihemed Henefiye, Rustemê Zal, Hetem û Silêmanê Sindî dikin ji bo cengnameyan wekî nimûne bidin. Herwesa beyta Sîseban û Beyta Kekemîr jî em dikarin wekî nimûne ji bo vî cûreyê edebî bidin. Beyta Hetemî jî behsa mêrxasî û qehremaniya yekî bi navê Hetem dike.

Der barê nasnameya Hetemî da em gelek tiştan nizanîn. Wesa diyar e eve lehengekî efsanewî ye û ev serhatiye jî xeyalî ye. Wekî ji beytê diyar dibe Hetem xortekî cihêl û lawekî sinêle ye. Dibêjin carekê Hz. Pêximberî (s.) hevalên xwe kom kirin û ji wan xwest yek biçê hinek goştneçîrê bîne. Hetem gote Hz. Pêximberî (s.): *“Ez dê biçim goştneçîrê bînim.”* Di wê navberê da qralekî kafiran hebû bi navê Xerdelîs. Wî xewnek dîtîbû ku yekî di xewnê da digote wî zewala te bi destê Îmamê Elî ye. Lewra ewî ji bo kuştina Îmamê Elî pîlan dikirin. Dema Hetem ji bo neçîrê diçe deşt û beyabanê, rastî leşkerên vî kafirî tê. Hetem hizir dike ku heke xwe wekî Îmamê Elî bide nasîn, kafir dê ji wî bitirsin û xwe wekî Elî dide nasîn. Kafir jî dibêjin: *“Ewê em esmanan lê digerîn, li erdan dest me keft.”* Hetem bi tena serê xwe li hemberî ordiya kafiran şerî dike. Piştî şerekî dijwar yê di navbera Hetem û kafiran da, Hetem tê kuştin. Hespê wî ji wê derê direve û tê mala Îmamê Elî.

9. BEYTA BIRAHÎMXANÊ HEKARÎ



Beyta Birahîmxanê Hekarî di edebiyata Kurdî da nimûne ye ji bo cûreyê zefernameyan. Zefername ji bo cûreyên edebî yê li ser zefer û serkeftinên di şerekî da hatine bidestêxistin tê gotin. Di edebiyata Kurdî da gelek serkeftinên mîrên Kurdan bidestêxistî wekî zefernameyan hatine tomarkirin. Em dikarin Beyta Birahîmxanê Hekarî û Beyta Bedirxan Begê ji bo vî cûreyê edebî wekî nimûne bidin. Belê mixabin ev beyte bi temamî negehiştîye ber destên me. Wesa diyar e eva me tomarkirî kême.

Birahîmxan Begê Hekarî kurê Mihemed Begê kurê Muhyî Sunne Begê kurê Îzzeddîn Şêr Begê Hekarî ji sala 1691an heta nêzîkî salên 1750ê mîratiya Mîrgeha Hekariyan kiriye. Di nav mîrên Hekariyan da wekî mîrekê bi hêz û çalak tê nasîn. Ev beyta li ser şerê di navbera Birahîmxan Begê Hekariyan û Teymezخانê serokê hêzên Îranî da hatiye honandin. Em wekî dîrok baş vênakevîn kanê ev şere tam di kîjan salê da qewimiye. Katibê Birahîmxan Begê Hekarî, Mîrza Mihemedê Yazicî di berhema xwe ya bi navê “Muxteser Ehwalî Umera” da behsa vî şerî dike. Wekî ew dibêje ev şere di salên xortaniya Birahîmxan Begê da li devera Sêro û Gengeçînê qewimiye. Di encama şerî da Hekariyan serkeftineke mezin bidestêxistin û deverên wekî Enzel, Somay, Biradost, Mêrgever, Têrgever, Deşt, Urmiye, Selmas, Xoy, Tabe û Tisoc ji aliyê Hekariyan ve hatine standin.⁹

9 Mîrza Mihemed Yazicî, *Muxteser Ehwalî Umera*, (Wergêran: Nizar Eyûb Gulî), Çapxana Spîrêz, Dihok 2012.

11. BEYTA ŞÊX EBDUSSELAM BARZANÎ



Ev beyta li ser Şêx Ebdusselamê Barzanî hatiye honandin. Şêx Ebdusselam Barzanî, kurê Şêx Mihemed Barzanî ye û birayê mezin ê Mela Mistefa Barzanî ye. Ji destpêka sedsala XXan pê ve ji bilî çalakiyên xwe yê deverê yê ayîni û çandî, dest bi xebatên siyasî û polîtîk kirine. Di nava malbata Barzan da yekemîn kesê dest bi xebatên siyasî-polîtîk kirî, Şêx Ebdusselam Barzanî ye. Li dor vê çendê Şêx Ebdusselam ji ragehandina Meşrûtiyeta II. heta berbanga Şerê Cihanê yê Yekemîn li ser bizava Kurdî ya neteweyî gelek xebatên siyasî pêk inane. Di dema van bizavan da Şêx Ebdusselam û eşîreta Barzan a di bin serkêşiya wî da li hemberî Dewleta Osmanî ya di bin rêveberiya Îttihad û Tereqiyê da, hatine hemberî hev û gelek mucadele kirine. Di encama van mucadeleyan da Şêx Ebdusselam ji aliyê Dewleta Osmanî ve hatiye girtin û ji aliyê Waliyê Mûsilê Silêman Nazîf ve di sala 1914an da li Mûsilê hatiye sêdarekirin.¹¹

Di vê beytê da behsa şerê di navbera hêzên waliyê Mûsilê Fazil Paşa û hêzên Şêx Ebdusselam yê di sala 1909 û 1910 da qewimî, tê kirin. Di van şeran da Şêx Ebdusselam Barzanî serkeftineke baş bi dest ve î nabû. Di beytê da jî behsa mîrxasî û qehremaniya şervanên Kurd dike. Me ev beyte ji devê Seyîd Umerê Kelêtanî wergirtiye:

11 Ji bo zêdetir agahiyan bnr: Kaplan, Yaşar, "Şêx Ebdusselamê Barzanî (1908-1914) Di Dokûmentên Osmanî Da", *Kovara Dîrok*, Hejmar: 13, Zivistan 2016-2017, Duhok.

12. BEYTA GARANÊ (ŞERÊ ÇELÎ Û TIYARIYAN)



Çelî navenda eşîreta Pinyaniş e li devera Hekariyan. Tiyarî jî mezintirîn eşîreta Mesîhiyan (Nestûriyan) e li devera Hekariyan. Kurd û Mesîhî bi sedan salan li vê deverê pêkve jiyane. Heta nîva sedsala XIXê ji nasnameya serekî ya tîkeliyên wan diyar dikir nasnameya eşîrî bû. Lêbelê piştî hatina mîsyonerên Ewropî ji bo vê deverê, hişmendiya neteweyî û dînî li nava Nestûriyan belav bû û tîkeliyên Musliman û Nestûriyan xirab bû. Ev şerê di navbera Çeliyan û Tiyariyan da li bihara sala 1915ê qewimiye. Piştî vî şerî li vê deverê bi cara yekemîn rengê tîkeliyên Kurd û Mesîhiyan guherî. Êdî şer li ser navê eşîriyê derkeft û bû dîndînanê. Ev şere bû sebeb ku Kurd xwe nêzîkî Osmaniyan û Nestûrî jî xwe nêzîkî Rûsan bikin. Çend heyv piştî vî şerî Şerê Cîhanê yê Yekemîn dest pê kir. Ji ber şerên di navbera Kurdan û Nestûriyan da welatê Hekarî sê salan bi tamamî ji mirovan vala ma. Kurd koçber bûn û çûne devera Bahdînan û Nestûrî jî koçber bûn û çûne devera Xoy û Urmîyê. Piştî şerî Kurd zivirîn war û wargehên xwe. Lêbelê Nestûrî êdî venegeriyan.

Ev beyta me durist kirî parçeyek e ji beyteka dirêj. Destpêka xirabûna tîkeliyên Kurd û Nestûriyan, rakirina fermana Nestûriyan, dagirkirina Hekarê ji aliyê Ūrisan ve û vegera Hekariyan ji bo war û wargehên xwe wekî beyteke dirêj hatibû ristîn. Lêbelê ev beyte bi tamamî nehate bidestêxistin. Lewra ev parçeya behsa şerê Çeliyan û Tiyariyan dike me amade kir. Ev beyte ji devê H. Ebdilayê Qasî, Ebdulkerîmê Zawîteyî hatiye wergirtin. Bendên beytê ji sêrêziyan pêk tê. Her ristek ji heşt kîteyan pêk tê:



Nivîskarê vê kitêbê Yaşar Kaplan demek dirêj e li ser folklorê Kurdî dixebite û di vê mijarê de gelek materyal berhev kirine. Di nava van materyalên berhevkirî de gelek beyt û destanên Kurdî jî hene. Nivîskar ji van beyt û destanan 12 hebên wan di vê kitêbê de bi cih kirine.

Beyt û destanên di vê kitêbê de cih girtine ev in:
Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn, Mem û Zîn, Sitî û Ferx, Hespê Reş, Yûsif Pêxember, Avdel Umeran, Şerê Kolana Qumriyê, Hetem, Birahîmxanê Hekarî, Îbrahîmê Kurê Hz. Mihemed (s.), Şêx Ebdusselamê Barzanî û Şerê Çeliyan û Tiyariyan jî di vê kitêbê de cih girtine.



9 786059 413428